Newroz **Hejmar(67)** **Rûpel (11)** **Nîsan 2006z – 2618k**

10 Nîsanê
Cejna zarokên Kurdistanê

Şêx birîmce Şam

10ê Nîsanê

di 10 ê meha nîsanê de, paytexta Sûryê li Şamê, taxa Zorava, Koma **Nûhilat** ya filiklorî, cejna zarokên kurd pîroz kir, ji wan re şahîyek xweş li dar xist, tê de bêtirî 50 zarokên kurd beşdarbû bûn. Bi stran, kovend û , pirs û bersivan, bi xwerina şekiran û birina xelatan zorakan şeva xwe borandin. Bi Beşdarya hin helbestvan nivîskar û nûnerên kavar û rojnaman û bi xwendina hin gotar û perçe helbest şev hate xemilandin .Koma Nûhilat ya mezinan û şaxa zarokên Nûhilat çend govendên xweşik û çend stranên zarokan yên ji bo vê ahengê amadekiribûn, bi taybetî ji zarokan re pêşkêş bûn.

Hêjayî gotinê ye em bêjin ku helbest û awaz tev yên komê bûn û bi taybetî ji bo zarokan re bûn.

Komela Ciwanên Kurd li sûryê (KCK) jî alkarîyeke mizin, di vê ahengê de kiribûn , namak pîrozahî ji bo cejna zarokên kurd xwendin.

11ê Nîsanî

di 11 ê meha nîsanê de, giropa **Mosa Enter** ahengek ji bo zarokan li Şamê li taxa Rukineldîn, di eywaneke mezin de, bi alîkarîya partiya **rêkeftin** û bi beşdarbûn, jimarek mezin ji zarok û xwediyên wan û bi hebûna hin hunermendên nas wek: **Rêber Wehîd** yê ko sê stran bi kurdî û yek bi Erebî pêşkêşî zarokan kir û çend nivîskar û helbestvan û nûnerên kovar rojname û partiyan beşdarbûn , hin perçe helbest xwendin.

Helbestvanekî Ereb jî di şevê de beşdarbû.

Bi hevkariya şaxê zarokên koma **Nûhila**t, yên ku du stranên zarokan pêkêşî zarokan kirin.

Pirograma ahengê xweş bû, rêvebirên şevê jêhatî û xurt bûn şeva zarokan baş borîya, zaro gelek şa bûn û pir keniyan û lîstin. Zarok tev hatin xelatkirin, eheng dora 3 ê katjimêran dirêj kir.

Biryarek şoven: Di 14/3 an deê xendekar Zekeriya Me'mo, ji herêma Kurdxêt, bi boneye sixêfên xwe bi destlatê kirine tê girtn. Piştê çend rojn, ji hemî dibistanên Sûriyê tê qetqndin .